

© Alexander – stock.adobe.com

## Shiroveyên
bêjeyan

**Konseya Bajêr:**
Civatek ji kesên hilbijartî li bajarekî. Ev kes derbarê Pêkvejiyanê û mijarên cûrbicûr ên bajarî wek Pergala Veguhestin û Hatûchûnê, Perwerdehî, Jîngeh, Abor û Chandê biryarê didin.

**Endamê Konseyê:**
Endamekî/a Konseya Bajêr, di rastiyê da Ramyarek.
Endam ji aliyê welatiyan va tên hilbijartin.

**Lêpirsînên:**
Pirsek derbarê rewshekê, wek mînak "Chend zarokxane li bajêr hene?" an pirsek derbarê bernameya Konseya Bajêr. Daxwazeka Pêzanînan dikare bi awayê devkî an nivîskî were hilêxistin.

**Daxwaz:**
Xwestekek ji Konseya Bajêr, wek mînak "Em daxwaza damezirandina Zarokxaneya Duzimanî dikin" an "Em daxwaza pêkanîna kursên zêdetir ên Ziman jibo kesên Karker dikin".

**Chend-Zimaniya Sirûshtî:**
Dema ku zarokek bi chend zimanan mezin dibe û wan hemiyan bi awayekî xwezayî hîn dibe.



© Peter Hinschläger

## Têkillî


**Ofîsa Shêwirînê ya Konseya Sazbûna Civakî li "Nadelfabrik"**
Reichsweg 30
Odeya A002
52068 Aachen
Telefon: 0241 432-56602
integrationsrat@mail.aachen.de
www.aachen.de/integrationsrat


Daxwaza dema hevdîtinê bi têkilliya digel hejmara telefona 0241 432-56602 an nardina Email'ê bo adresa integrationsrat@mail.aachen.de pêkan e.

**Yekîtiya 107 a Konseya Sazbûna Civakî li Parêzgeha Nordrhein-Westfalenê**
Konseya Sazbûna Civakî ya Parêzgehî ya "NRW"
info@landesintegrationsratnrw.de
www.landesintegrationsrat.nrw


*Chapbûyî li ser kaxeza ku sedî 100 dê were nû-bikaranîn*

**Bajarê Aachenê**
Sharedarê Bilind
Warê pisporî yê bicihkirinê, Karên Civakî û Sazbûna li Civakê
Ofîsa Konseya Sazbûna Civakî
Reichsweg 30
52068 Aachen

**www.aachen.de**




# Konseya Sazbûna Civakî ya Aachenê

**Em bi hev re li bajarê xwe pêsh dikevin.**

© christianchan – stock.adobe.com

www.aachen.de/integrationsrat

Landesintegrationsrat NRW

stadt aachen



## Konseya Sazbûna Civakî (Entegrasyon)

nûnera berjewendiyên we ye

Derdora 255000 kes li bajarê dijîn.

Sê yekê wan di eslê xwe da ji derve hatine. Esliyet û etnîka van kesan ya 160 welatan e. Ewna pêkhateyeka rengîn ji ziman, çand û ol û baweriyên cûrbicûr tînin vî bajarî. Konseya Sazbûna Civakî dibe dengê wan gishtan.

Aachenê welatê we ye. Konseya Sazbûna Civakî nûnera berjewendî û menfî’etên we ye – bi taybetî di

- **rewsha Bicihbûn û jiyanê**
- **berdestbûna dibistan û kar**
- **serpêhatiyên têkildarî bêparbûn û nijadperestiyê**

Pirsên xwe ji Konseya Sazbûna Civakî bipirse!

Girîng: Konseya Sazbûna Civakî pirsgirêkên kesane ya mirovan çareser nake. Ev ke di qonaxa yekem da nûnera berjewendiyên wan kesan e ku mafê xwe yê welatîbûnê wergirtine an sabiqeya wan a Kochberiyê heye.



## Konseya Sazbûna Civakî

chi ye?

Konseya Sazbûna Civakî Komîsiyonek e ku kesên li vir bi awayekî demokratîk tên hilbijartin. Ev konsey beshek ji saziya rêveberiya bajêr e. Di vê konseyê de endamên Konseya Bajêr*, kesên, ku mafê hemwelatiye wergirtine, her wiha nûnerên kesên ku sabiqe û serbihuriya wan a Kochberiyê heye, endam in. Armanc pêkanîna karekî bash li kêleka hevdu ye. Girîngtir ji hemiyan ev e, ku ev konsey derbarê hevdengiya siyasî di warên cûrbicûr ên jiyana we da ye! Konseya Sazbûna Civakî ango nûnera xwestekên we ye.

Konseya Sazbûna Civakî ya bajarê Axênê ji 21 endaman pêk tê. Mirovên ku ne xwedî hemwelatiya vir in, 14 nêneran wek endamên Konseya Sazbûna Civakî hildibijêrin. Konseya Bajêr* jî heft endamên* xwe ku ji partiyên cûrbicûr in, dike endamên vê konseyê.

Endamên Konseya Sazbûna Civakî her pênc salan carekê tên hilbijartin. Hilbijartina Konseya Sazbûna Civakî bi awayê normal di heman roja hilbijartina xwecihî da pêk tê. Bi hevkariya endamên Konseya Bajêr, biryarên Konseya Sazbûna Civakî bo saziya rêveberiya bajêr tên veguhestin. Wek mînak bi dayina Daxwaz* û Lêpirsan* ji Konseya Bajêr. Ji billî vê di mijarên tekildar de Konseya Bajêr erkdar e, ku nêrînên Konseya Sazbûna Civakî bibihêze.

Gelo hûn dixwazin bizanin kanê hevdengiya siyasî chi rolekê di bajarê we heye? Gelo hûn dixwazin ku di civîneka Konseya Sazbûna Civakî da beşdar bibin? Bi me ra bipeyivin!

*Hûn dikarin shiroveya bêjeyan li pash vê danezanê bibînin.



## Mijarên

Îhtimalî

Sazbûna Civakî ango Entegrasyon hemî waran digire ber xwe – Dibistan, her wiha Bazara Kar, demên betlaniyê û jiyana bajar li navcheyên cuda cuda. Konseya Sazbûna Civakî ji bihevrejiyana wekhev a kesên Almanî û Kochberan pishtgiriyê dike. Chalakiya vê konseyê divê bibe sebeba xurtkirina rewabûn û rêzgirtinê di hemî astên jiyana siyasî da. Babetên li jêrê ev mijarên herî tekildar in:

- **hevdengiya Siyasî**
- **Perwerdehî**
- **Kar**
- **beshdariya chandî û Civakî**
- **Hewldanên jibo têkoshîna dijî nîjadperestî û cihêkariyê**
- **Sazbûna Civakî ya Penaberan**
- **Pishtgirî ji Chend-Zimaniya Sirûshtî**